

Zewaca zarokan û encamên vê

»»» R:10



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agiri

*Duheftînameyek Siyayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (417) 07-03-2022 Buha (1000) Tûmen*

11`ê Reşemhê yek ji rûpelên şevqdarê dîroka xebata PDKÎ ye

»»» R:3

Rojhilat xwe ji bo Newrozê amade dike

»»» R:7

Şerê Rûsya-Ukrayna û kartêkirina wê li ser Rojavayê Kurdistanê

»»» R:8

Yê dorandî ji du aliyan ve dorandiye

Li ser bîryara Vilamîr Pûtîn serkomarê Rûsyayê, roja Pênçsemî 5`ê Reşemhê êrîşa leşkerî lidijî xaka Ukrayînê deştê kir, û bi wî awayî dawî bi qonaxeke bênavber ya di navbera Rojava û dewleta Rûsiye û rikeberiya çendîn salan ya di navbera Rûsiye û Rojava de hat û herwisa qonaxeke din deştê kir.

Pêka zaniyaryên peywendîdar ev êrîşa li rêya balafirên şerker yên Rûsye lidijî çendîn bajarên li rojhilat û bakurê Ukrayînê û herwisa moşekhavêjî û damezîrandina hêza bejayî ji aliyên başûrê Ukrayînê û êrîşa sayîbîrî ya Moskoyê li ser jêrxanên aborî û îdarî yên Ukrayînê deştê kir. Di yekem bertek nîşandanê de jî, Uilaf Şoltiz serokwezîrê Almanîya ev kiryara Rûsye şermezar kir û weke bînpêkirina berçav a yasaya navneteweyî binav kir û got: Eva roja herî tarî ya Ukrayînê ye! Herwisa Borîs Canson serokwezîrê Birîtaniya tevî şermezarkirina êrîşa lidijî Ukrayînê ragihand ku Pûtîn bi wî karî bi bê hebûna ti sedemê, rêya xwînêjî û kavlkirinê hilbijartîye û bi xatircemî ve em û hevalbendên xwe bersivê goncav bi wan êrîşan didin. Di dawiyê de jî, li 11`ê Reşemhê, hevdem ligel heftemîn roja êrîşkirina Rûsiye li ser xaka Ukrayînê, koma giştî ya Neteweyên Yekigirtî komcivîneke lezgîn lidarxiştin û bi piraniya dangan ku bi wî awayî ne: Li 141 dengên erênî li beramber 5 dengê nerînî ku bi wî awayî bûn, Rûsiye, Kureya Bakur,

Bîlarûs, Îrîtîrê û Sûriye, ev kiryara Rûsiye şermezar kirin. Lê di vê navberê de welatên weke, Îran, Çîn, Hindoştan û Îmrata jî dengê bê alî dan! Di raştîyê de sîstema zal ya Rûsiye a niha mînakê wan hikûmetane ku rojgarekê bixwe mezinhezên cihanê bûn û piştîre bi sedemên cuda lawaz bûne û derbaziyeke tijî serbilind ku li xeyalên wan de ye bixwe dîmendî dîkin. Bi wateyeke zelalîtir Pûtîn dixwaze Rûsiye bizivîrîne bo serdemê deştîlaldariya Yekîtiya Soviyeta berê û heta pêş ji vê jî bo serdema Rûsiya Têzar û herwisa xevna jeopolotîk li mejiyê wî de ye. Bitaybet ku, niha digel komê kirîzên aborî û siyasî û rewatiya navxweyî ber bi rûye.

Ya ku eşkere ye, Komara Îslamî ye ku tev deman xwe şîrîk û hevalbendê herî nêzîk yê Rûsiye dizane, herçend ku bi awayî fermî alîgirî li helwesta Pûtîn nekiriye lê, bi kiryar selmandîye ku nikare dijayetî jî bike ku ev cure siyaseta bixwe ji me re dibêje ku, rejîm li kîj eniyê de cih giritiye.

Herwisa li derheq Rûsiye de ku berê cem serkirdeyên Tehranê nûnerê li dijî xwedavendan bû û niha bûye welatê dostê Îranê! Li Îslamê de 10 xalên girîng hene ku dibe mirov hizir ji wan bike û wan şîrove bike:

1. Rûsiye heta niha ti demî rejîma Îranê weke hevalbendê şîratîjîk yê xwe nedaye zanîn.
2. Rûsiye hemû demî Îranê weke amûrekê bikar aniye bona çareseriyên arîşe û girftên xwe yên digel Amerîkayê de.
3. Rûsiye ji warê neft û gaz ve rikeberêkî serhişk yê Îranê ye û li dijî veguhastina gaza Îranê bo Ewropayê ye, çimkî eva bazara fermî ya wî bixwe ye.
4. Rûsiye li Şewra Ewlehiyê de çendîn caran li dijî bernameyên navkî yên Îranê deng daye û hin caran jî bîryarname li ser pêşniyara Rûsiyê bixwe tînin kirin.
5. Welatê Rûsiye berewajiyê îd`ayên Tehranê lidijî rewta lezgînî ya mehandîna Uranyûmê ji aliyê Tehranê ve ye û Îrana xwediyê zanîstî navkî bi qazanî xwe nabîne.



6. Li serdema şerê 8 salan de Soviyeta berê yek ji piştewanên Îraqê bû.
7. Rûsiye hej ji vê yekê dike ku, li warê leşkerî ve Îranê piştguhê bixîne çimkî, ev çek û teqemeniyên ku, ji Îranê re tînin firotin şîyaye paşerojerke goncav bo Moskoyê li pey xwe bîne.
8. Li berewajiyê Tehranê, Mosko li dijî Îsraîl nîne û di wî warî de nikare hevterîbê Tehranê be.
9. Heta niha Rûsiye amade nebûye ku moşekên S400 bifroşe bi Îranê lê, ev cura çeka ji welatên weke Hind û Turkiye re firotîye.
10. Sîstemên pêşkevî yên berewajîkirinê yên Rûsiye li Sûriye li seranserê wan salan de ku, Îsraîl êrîş kiriye li ser bin-

keyên Tehranê yên li Sûriye de, tenê temaşeker bûye, Heta li ti cihekê de êrîşên Îsraîlê yên li dijî Îranê ji aliyê Moskoyê ve bersiv nehatine dayîn. herwisa aliyekî din yê vê behskirinê dibe virda de bê gotin: Ya ku aboriya cihanê bi wan şerên han tûşî serevrazî û sernîşîviyê kiriye û bilindbûna nîrxan, hejariya zêdetir li Îran û welatên li halê şer de berfireh kiriye û nerizayetiya xelkê zêde û zêdetir dibin. Wate Îran aloz bûye û xwediyê aboriyeke tevlihev dibe li meydana rikeberiya hêzên dijberan de. .

Ya ku virda bo gelê me yê Kurd zêdetir dibe rojev û dibe tekezî li ser bê kirin, di raştîyê de helwesteke hûr û hişyariya me ye li hember bûyer û pêşatan de ku, bikarin ji wê ava şêlo masîyan bigirin û pêş merca serkevîna me jî, li vê lîdvanê de ye ku bi xatircemî ve li paşerojê de bo Îranê çê dibe ku weke vîdedana arîşe û pîrsîrêkan û hewldan bo yekrêzkirina xebat û bîhêzkirina bajar ku milê xebata rojhilatê ye.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Li roja 11`ê Reşeme ya 1357`an a Rojî, çend meh piştî veg-erîna beşek ji rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bo navxweyê welat û çalakiya nihênî û rêkxistina wê di nav civatgehê de, piştî vê ku ser-hildana gelên Îranê bi ser desthilata Paşayetî de serkevt, di kombûneke berfireh a cemawerî de, rêberê netewa Kurd Dr. “Qasimlo”yê nemir, mizgîniya berde-wamiya xebata gel bo gihîştin bi mafên wê da û ragi-hand; Li vir şûnda ev çalakiye û têkoşan û cangoriye bi êşkere bi rê ve diçe û roja 11`ê Reşeme bû bi roja peymannûkirina PDKÎ û xelkê Kurdistanê heta gihîştin bi azadiyê.

Di wê rojê de bi dehan kes li meydana Mihabadê, wate heman cihê ku Komara Kurdi-stanê tê de hatibû avakirin, kom bûn. Desthilata zordar a Paşayetî ku serdemekê radigi-hand ku artêşa wê li Rojhilata Navîn de “jandirme”yê de-verê ye û nezim û ewlehiya destçêkiriya xwe bi ser de-verê de disepînin, ji hev hate hilûşandin û Şah reviya!

Li Mihabadê jî, kombûna sed hezar kesî bo pêşwazî ji berde-wamiya rêbaza Komarê bi rê ve çû!

Di wan rojan de, artêşa Rûsi-yayê bi hemû cure çekek bal-istîk, balafir, diron û ya heye û nîne êrîş kiriye ser Ukrayna cîranê xwe! Di wî şerê naberan-berî de, Rûsiya duhemîn artêşa bihêz a cîhanê wisa hesab dikir ku dê di heyama 24 demjimêran de paytexta Ukraynê bigire, lê zêdetir ji deh roj e her ji dûr ve mêzeyê paytextê dike, û bi avê-tina mûşek û bombe bi ser

Hêza çek an hêza xelk?



Ukraynê de rojreşiyê dibarîne,

ji aliyê dinê jî, artêşa Ukraynê bi kêmtirîn îmkanat û hin caran jî bi destê vala li hember tankên Rûsiyê derdikeve.

Di wî şerê naberanberî de, belkî Rûsiye bikare bi hêza leşkerî ve derbasî nav “Kiev”a paytextê be, lê bo heta hetayî di dil û hundirê xelkê Ukraynayê de hatiye derkirin û dujminayetiyeke heta hetayî bo xwe kirî.

Eva ku xweragiriye li Ukraynê bihêz dike, ne mûşeka balistîk an navkî ye, belkî îradeya netewa wê ye bo berxwedanê û her ev îradeya netewî ye bo derbasbûn ji bindestî û çav ji destê Rûsi-yabûnê ku Rûsiya nigeran kir û êrîşa leşkerî li dijî wê kir.

Ukraynek ku di warê kultûrî û dîrokî de gelek ji Rûsiyayê nêzik û tîkel bû, ew gihîşt bi wê qinaetê ku xwe ji Rûsiyayê derbas bike û serxwebûna wê ya siyasî li rûniştin li cem Rûsiyayê pê baştir bû. Derbasbûn ji bindestiyê îradeya netewî dixwaşt û xweragiri li hember duyemîn artêşa mezin a cîhanê, bi wê îradeyê bi rê ve diçe.

Ku em çav ji wê serpêhatiyê dikin, cardin dizivirine meydana Mihabadê û kombûna Dr. “Qasimlo” digel netewa Kurd ku hem dixwaşt ji bindestiyê rizgar be û hem çend meh piştî hingê li hember fermana cîhadî ya Xumeynî xweragiriyeke bêhempa kir. Dîrok îsbat kiriye û îsbat dike, herçiqas çek ji bo parsatin û berevanî ji xwe hewce ye, lê ya ku şeran û demsalên dîrokî yekalî dike, îradeya netewî ye bo xwenîşandan û rijdbûn li ser hebûn û kirameta mirovî û netewî.

11'ê Reşemhê yek ji rûpelên şevqdarê dîroka xebata PDKÎ ye



N: Noredîn Sofîzade

Di dîroka xebata rizgarîxwazî û mafxwaziya heçî neteweyekê de, renga hin xal û rojên girîng û jibîrneçuyî hebin ku weke, xala dest pêkirin û ew roj di dîroka bizava vî neteweyê de weke rojeke herî pirşanazî bo vî neteweyê û xebat û berxwedaniya vî bî zanîn.

Rojên wiha pir şanazî di dîroka tevgera rizgarîxwaziya me Kurdan de zefin.

Yek ji wan rojên jibîrneçuyî û girîng û cihê şanaziya gel û xebata Rojhilatê Kurdistanê ku, hertim li dîroka berxwedaniya vî perça ji Kurdistanê şevq dide, roja 11'ê Reşemhê ye, 11'ê Reşemhê roja ragihandina xebata eşkere ya PDKÎ ye.

Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê ku, piştî jinavçûna Komara Kurdistanê li sala 1946'an, dest bi xebata nihînî kir û di wê heyamî de rastî gelek dijwarî û dana nîrx û bedelên mezin hat, û qonaxên curbicur ê xebatê derbas kirin, piştî derbasbûna nêzî 33 salan ji xebata nehînî û bi hemî dijwariyên li ser rîya xwe, lê berdewam bû, û nehêla Komar û Pêşewa kor ocax be û gelê Kurd li Rojhilatê bî hêvî bimîne.

Dema ku di sala 1979'an de, şoreşa gelên Îranê li dijî rejîma Paşayetî serkevt û heya qasekî rewşek azad perê xwe li ser welat de kêşa û derfeta kar û xebata eşkere ya siyasî hate pêş, Hizba Demokrat ku piştî 33 salan, ji nû ve li himbêza ax û gelê xwe de bû, roja 2 yê Adarê "11'ê Reşemha 1357" an, bi lidarxistina Mitîngeke mezin, dehan hezar kesî li bajarê Mehabadê de, xebata eşkere û siyasîya xwe ragihand, û piştî jî, li zef bajarên Rojhilatê Kurdistanê, mitîngên

wiha hatine lidarxistin. Di Mitînga mezin a Mehabadê de, Dr. Qasimlû sekerterê Giştî yê PDKÎ, di axivtineke dîrokî de, bo beşdarên mitîngê û hemî gelê Kurd ragihand: PDKÎ di heyama 33 salên derbasbûyî de, nîrxên mezin dane, gelek dijwarî dîtine, endam, pêşmerge û kadrên wan rojên tal derbas kirine û rastî derbiderî û malvêraniyê bûne, heya niha nehêlane ala xebatê bikeve, nehêlane xebat raweste, nehêlane komar bî rêwîng bimîne, Îro piştî derbasbûna wan hemî dijwariyan, em carekî din di nav gelê xwe dene û xebata eşkere ya xwe radigehînin.

Ev mitînga û ragihandina xebata eşkere ya PDKÎ, di 11'ê Reşemha 1357'an de, bû sedem ku careke din bi sedan hezar kesî weke endam û nêzî hemî xelkê Rojhilatê Kurdistanê wekî alîgir, dehan hezar Pêşmerge canfîda li dewra siyasî, armanc û bernameya Hizba Demokrat kom bibin.

Her ewa bû ku, dema rejîma taze geheştîye li ser deshilatê ya li Tehranê xwaşt gelê Kurd û Rojhilatê Kurdistanê jî, hevşeweya zef navçe û neteweyên din ên Îranê teslîm û bêdeng bike daku, dev ji daxwazên neteweya xwe berdin, PDKÎ û ev hêza xwe ya mezin a gel, biryara berxwedaniyê bî mînak didin û bo heyama 3 salan pareke zef ji axa Kurdistanê azad û dûr jîdestê dîktatoriya komara Îslamî ma.

11'ê Reşemhê di nav gel de îradeya berxwedaniyê çêkir. Seha netewî di nav gel de ji heçî demê bîhêztir kir. Yekitî û yek helwestî li ser daxwaziyan netewî çêkir. Piraniya gelê Kurd li Rojhilatê bî rêkxistin kir.

Hêza berxwedaniyê li hember êrîşa dijmin de çêkir. Bo heyama çend salan Kurdistan ne tenê bo gelê Kurd, belkî bo hemî xebatkarên Îran û neteweyên din re kiribû çepera azadîxwazan. Ger heya îro jî em dîna xwe

bidinê, bandora wê gotara netewî ku hasila wê ev çend xalên serwe bûn, herwisa ne tenê ev xalên han lawaz nebûne, belkî bi derbasbûna zeman bîhêztir jî bûne. Îro rojê em bi şanazî ve dikarin bîjin ku ewa behra ked û xizmet û derbasbûiya PDKÎ û pêgeha bîhêza wê ye di nav gel de ku kite neteweyekê di nava hemî neteweyên Îranê de ye, ku ji hemî waran ve, wekî şanaziya hebûna gotarekî bîhêz a armancên neteweyî, xwediyê rêkxistîneke bîhêz, xwediyê îradeyê bîhêz a berxwedaniyê, xwediyê şanaziya teslîm nebûna li hember zordarî û dîktatoriya rejîma Îranê de ye.

Ragihandina xebata eşkere ya PDKÎ di 11'ê Reşemhê de, destpêka xebata wê Hizbê nebû, belkî gorî derfeta ku hatî pêş, û piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê, wê Hizbê di nav gel de carekî din ji nû ve peymanî berdewambûna di xebatê de ji xelkê re ragihandin.

Wê Hizbê her ji roja avabûna xwe ve, li sala 1945'an heya îro, tenê bo demeke kurt jî dest ji xebatê bernedaye, û di heyama 76 salan temenê pir şanazî yê xwe de gorî derfetên qonaxên curbicur, xebat destpêkiriye û serfîrazîyên mezin lipêxema xizmet bi doza netewî de, bo xwe tomar kiriye, wekî:

— Piştî derbasbûna li ser damezrandina xwe, mezîntirîn destkefta dîrokî bo gel bîdestve tîne û Komara Kurdistanê ava dike.

Rêberê yekem yê wê Hizbê Pêşewa Qazî Mihemed ku, hevdem serkomarê Kurdistanê bû, piştî têkçûna Komarê, amade nebû gelê xwe bicî bîhêle, û bi gorîkirina canê xwe bo heta hetayî bû remz û sembola netewî. Piştî jinav çûna Komarê endamên wê Hizbê amade bûn hemî dijwariyekî wekî girtin, kuştin û derbiderî, dijwariyê bibîne û bi nehîni xebata xwe bi rê ve bibe û nehêlin rêbaza wê hizbê kor bibe.

— Di heyama salên 67 û 68'an de, xebatkarên wê hizbê tenê jibona paraştina serbixweyî ya wê Hizbê û ragihandina berdewamiya xebatê, qonaxekê herî dijwar û newekheve şerê çekdarî li dijî rejîma Paşayetî dest pê kirin û bi xwîna xwe dîmena man û mewcudiyet û berdewamiya PDKÎ li ser rê û rêbaz û xwebatê, bi gelê xwe dan xûya kirin.

Di sala 1979'an û piştî serkevtina Şoreşa gelên Îranê, di 2'ê Adarê li hember 11'ê Reşemhê bi qonaxa rûpelekî zêrîn weke ragihandina xebata eşkere ya wê Hizbê bî hesbandin.

— Di dehka 80'î ya Zayînî de bo heyama pitir ji 10 salan qonaxa şerê partîzanî li hember rejîma îranê de, bû pêşengê berxwedaniyê.

— Di qonaxa Rasan a Rojhilatê de, piştî derbasbûna heyameke zêde, heya qasekê kêmbûna hizûra Pêşmerge li navxweya Rojhilatê Kurdistanê de, me dît ku bi peyama pêkve girêdana xebata Bajar û Çiya, Hizba Demokrat çawan karî Rojhilatê vejîne û rake coşê û tovê îradeya xwerağiriyê û xebatê bîreşîne.

Ku wisaye ev qonaxên girîng di nav dîroka xebat û qurbanîdana wê Hizbê de, hemî girêdayî bi hevîn û heçî kîjan ji wan qonaxan bandora xwe hebûye û heçî çî wê hizbê evraz û nişîvên dijwar derbazkirbin, kevtiye rabûye lê, qet dest ji xebatê ber nedaye, û ev qonaxên han û ji wan 11'ê Reşemhê û ragihandina xebata eşkere ya PDKÎ, tenê nû kirina peymanî berdewam bûna li ser rêbaz û xebatê ye, û wê yekê jî dide xûyakirin ku li heçî qonaxekê de, ew Hizba bixwaze dikare pêgeha bîhêz û bî rikebere xwe di nav xelkê Rojhilatê Kurdistanê de bi dost û dijminan bide kîvşê.

Peyama 11'ê Reşemhê jî, yek ji wan ceribandînan mezin a dîroka dûr û dirêj ya PDKÎ ye.

Pîroz be 43. emîn salvegera ragihandina xebata eşkere ya PDKÎ

Sedemên êrîşkirina Rûsyayê li ser Ukrayînê



Dr. Mihemmed Husênzade
W: Hesên Mukerem

Piştî derbazbûna çendîn salan li ser hebûna arîşe û aloziyên dinavbera welatê Rûsyayê ji aliyekî û welatên Rojayayî û Ukrayînê jî ji aliyek din ve, di encama heftaya derbazbûyî de Viladimîn Pûtîn serkomarê Rûsyayê fermana êrîşî leşkerî bo li ser Ukrayînê da. Serbaret bi sedemên wî şerî dîtingehên cuda hene.

Hin kes wusa dizanin ku Pûtîn dîtingeheke êrîşker heye û dixwaze wekî Hîtlêrê dest li ser tevahiya Ewropayê de bigire. Lê, eger li ser şîyan û fektorên hêzên jiber destê Rûsiyayê de hûr bibin, ev dîtingeha dîtingeheke lojîkî nîne. Birêveber û biryarderên Rûsiyayê li pêgeha lawazbûna xwe haydar in û wusa nîne ku wan di rewşeke wiha de hizirkirina li wê bijardeyê kir bin.

Hinek jî behs ji kesayetiya dîktatoriya Pûtîn dikin ku, bûye sedema serhilata şer. Di raştîyê de ya ku Pûtîn siyasetvanekî ser hişke raşte lê, Pûtîn her di destpêkê de ev taybetmendiya han hebûye û ev heyama 20 salane ku kursiyê desthilatê li Kirîmlînê qurix kiriye, ya ku niha bûye pirsyar eve, niha çi qewmiye ku serhildana şerekî diqazanca xwe de dibîne? Herwisa desteyek jî nerînên wan wuha ne ku, Rûsiya dixwaze Saziya Nato û Amerîkayê bi awayekî tewav li rojhilatê Ewropayê de derbixîne û êrîşkirina li ser Ukrayînê destpêka wî şerî ye, eva dîtingeke ku dikare hilgire pareke zêde li raştîya wî şerî be lê, welatê Rûsyayê şîyana derxiştina wan hêzan hebûna her li destpêkê de rê nedida da ku welatên li rojhilatê

Ewropayê bibin bi endamê Saziya Natoyê.

Em dikarin bêjin sedema sereke ya çê bûna wî şerî rikeberiya dinavbera welatên mezinhez de ye ku, hewldanên Saziya Natoyê bona endambûna welatê Ukrayînê di wê saziyê de, û hewldanên Rûsyayê jî bona rêgirî kirina di endabûnê de dengdaneve daye. Helbet ji aliyê exlaqî û yasayî ve, welatê Ukrayînê weke welatekî serbixwe mafê wê bixwe ye ku li ser çarenivîs û siyasetên derve û rê û cihên leşkerî yên bona dabînkirina ewlehiya xwe biryarê bistîne. Lê mixabin, siyasetên navneteweyî yên meydanên cî bi cî kirina pêwerên exlaqî yên wan tune ye, bitaybet welatên mezinhez ku tenê heta wî cihî girîngiyê bi exlaq û yasayê didin ku, li berjewendiyên wan bixwe de be, yan bixwe xwe çemandina bo yasayê bi awayek eşkere bi zirara berjewendiyên wan de be.

Bi endambûna Ukrayînê li Saziya Natoyê de, pirseke stratîjîke hem bo Natoyê û hem jî bo welatê Rûsyayê ye. Dizanin ku hevalbendiya leşkerî ya Natoyê ya li 4'ê Nîsana 1949'an bi beşdariya welatên weke, Amerîka, Îsile, Birîtaniya, Beljîka, Danîmark, Kanada, Logizemburg, Norwêj û Holandayê bi mebesta pêşgirtina li berfireh bûn û pel avêtina Yekîtiya Soviyetê hate avakirin. Piştî welatên weke, Turkiye û Yûnan li sala 1952'an, Almaniya li sala 1955'an û Spaniya li sala 1982'an weke endamên nû yên wê saziyê hatin wergirtin, jiber wê jî Yekîtiya Soviyetê, Hevalbendiya Varşoyê pêka rêk-kevtinnameya meha Adara sala 1955'an bi beşdariya 8 welatên weke, Albani, Almaniya, Rojhilat, Bulgariya, Çeklosvakiya, Soviyet, Romanî, Poloniya û Bugariya pêk anî. Nato û Varşo sereketirîn hevalbendiyên leşkerî yên li serdema şerê sard de bûn ku, nûneratiya yekem a

wan nûneratiya cihana Rojava û ya duyem jî nûneratiya cihana Rojhilat dikir.

Piştî hilûşîna dîwarê Berlînê ya li sala 1989'an de, û hilweşiyana Yekîtiya Soviyetê li sala 1991'an hevalbendiya Varşoyê jî jihev hilweşiya. Lê, berewajî Saziya Natoyê ber bi aliyê sînorên Rûsiyayê pel avêt. Li sala 1997'an de sê welatên weke, Poloniya, Hengariya û Komara Çêk bûn bi endamê wê saziyê, wate nêzikî 700 kîlometran ber bi aliyê Rojhilat û Rûsiyayê pel avêtiye.

Li sala 2004'an de welatên weke, Oûstraliya, Bulgariya, Lîtvaniya, Lîtonî, Romanî, Silovakî û li sala 2009'an de jî Albaniya û Korwasî bi fermî bûn bi endamê wê saziyê. Berê hinek ji wan welatan endamê hevalbendiya Varşoyê bûn û di bin desthilatdariya Soviyet de bûn û Rûsiya jî wê rewte razî nebû. Lê, arîşeya serek li sala 2008'an de xwe derxişt ku, biryar hat standin welatên weke Corciya û Ukrayîniya bibin bi endamên Saziya Natoyê.

Her di wê demê de Pûtîn helwesteke tund girt. Û bi awayê eşkere jî ragihandin ku, endametiya welatê Ukrayînê li Saziya Natoyê de gefeke raasteraşte li dijî Rûsyayê. Heta di hevpeyvîna digel Boşê kur ku wê demê serkomarê Amerîkayê bû de got: "Eger Ukrayîna hewla endambûna li saziya Natoyê de bide, wiha dawî bi hebûna xwe aniye".

Her bi wê sedemê ye ku bi bê xwandina wê dîrokê nabe ev gefxwarinên niha şirove bikin. Helwesta Rûsiyayê evqas tûnd bû ku, heta welatê Feransa û Almaniyayê di wê demê de nîgeraniya xwe li derheq wergirtina Ukrayîna û Corciyayê nîşan dan.

Hewceye virda îşare bi vê yekê bikim ku, gefxwarina Rûsyayê li dijî welatê Corciyayê ya li sala 2008'an de û

wergirtina navçeyên weke Abxaziya û Ovstya Bakur her girêdayî bi vê piroseyê bûn. Ev arîşeya han demekê evqas kûr bûye ku, Amerîka û Ewropa di guhertina desthilatê li sala 2013'an ya li Ukrayînê de destêverdan kirin û serkirdeyek girêdayî Rojavayê kirin desthilatdar. Û li hember de Rûsyayê jî navçeya Kirîme dagîr kir û alozî û nakokiyên xwe jî berdewam kirin bona vê ku bikare bandorê li ser desthilata Ukrayînê de hebe. Lê, encama Mosko û Kîyêfê nekarîn bigihîjin bi encamê û biryara şer standin.

Lê, bi wî awayî ku berê jî min îşare pê kirbû, eva zêdetr şerê welatên mezinhez ku li Ukrayîniya de rû daye. Ji aliyekî ve Saziya Natoyê bi serkirdayetiya Amerîkayê hewl dide Ukrayînê bike bi endamê Natoyê û li sînorên Rûsiyayê nêzik bibe û Rûsiye jî weke mezinhez vê yekê erê nake û biryarderên wî welatî bilî vê yekê dinavbera xwe û Ukrayînê de peywendîyeke dîrokî dibînin di nêzikbûna wî welatî ji Yekîtiya Ewropayê re û berfirehbûna demokrasiyê di vî welatî de jî nîgeranin.

Birêveberên welatê Rûsyayê demokrasiyê weke amûreke givaşê ya welatên mezinhez bona guhertina rejîman û anîna li ser kar a desthilatdarên nêzik bi xwe mêze dikin. Ev yeka taybetmendiya welatên ne demokrat û kesên weke Pûtîne ku demokrasiyê weke sedema bidawîbûna desthilata xwe dibînin e.

Her ji ber vê yekê ye ku welatên nêzikî Rûsyayê niha piraniya wan li rêza welatên serhişk de ne. Komara Îslamî û Sûriye zeqitirîn û berceste-tirîn mînak in.

Li kêlega vê yekê de jî, birêveberên Rûsyayê dibêjin armanca sereke ya Saziya

»»»Doma R: 4

Natoyê serdestiya stratîjk e ji rûyê siyasî û leşkerî ve. Pûtîn bangeşeya vê yekê dike ku hem Yekîtiya Ewropayê û hem jî Saziya Natoyê di heyama salên wê dawiyê de, bi awayek bêsînor alîkariya Ukrayînê kirine. Û eger jî bi awayê fermî bibe bi endamê Natoyê dikare hemû cure moşekên êrîşker û herwisa sîstema berevanîkirin a lidijî moşekî li ser sînorên Rûsyayê cihgîr bike û ev yek bi wateya dawîpêhatina hevsengiya hêzê li asta cihan û serdestiya Amerîkayê ye û heta ji aliyê navkî ve ye.

Pûtîn dibêje: Li heyama salên derbasbûyî de û bitaybet li serdema Barak Omaba serkomarê berê yê Amerîkayê de, li çarçêveya pilana yekparçeya dike moşekî ya li sala 2010'an de ragihandin, hinek li radar û moşekên wê sîstemê li welatên Romaniya û Poloniyayê cihgîr kirine û beşek ji wan jî li ser gemiyan danîne.

Her ev pîlana berî pîrsa Ukrayînê, bo Moskoyê bibû cihê nîgeraniyê, her bi vê sedemê ye li heyama salên derbasbûyî de, berdewam çendîn corên moşekan cerbinandine û ragihandiyê ku moşekên wan dikarin ji vê sîstemê derbas bibin û wan jinav bibin.

Herwisa Rûsiye ji vê yekê agehdare ku, di eger endamebûna Ukrayînê di saziya Natoyê de, her cure şer û pevçûn digel wî welatî bi wateya rûbirû bûna digel tev endamên Natoyê ye çimkî, pêka madeya 5 ya esasnameya Saziya Natoyê, êrîşkirina li ser her welateke endam di vê saziyê de weke, êrîşkirina li ser tev endamane û pêka vê yekê tev welatên endam berevaniyê ji vê welatî dikin ku êrîşî li ser hatiye kirin.

Herçend ku ev hevkrî û rikeberiyên dinavbera welatên mezinhez de bûne sedema avisbûna wî şerî. Lê, niha ev heyama 7 rojane ku li ser wî şerî de derbas dibe, Rûsiye di bin givaşên cihanî yên zef de ye û xuyaye ku her ev yeka wusa jê kiriye ku şewaza cî bi cî kirina operasyonê bê guhertin bo vê ku kêmtirîn zirar hem ji hêzên xwe û hem jî ji xelkê sivîl yên Ukrayînê bikeve. Xuyaye ku ev şera her li deştêpêkê de bo Pûtîn şerê deştêkeftinê nebûye.

Belkî, şereke ku dikare nefreteke zêde li Rûsiye di nav hevvelatîyên Ukrayînê de çê bike û hevdem jî, ji rûyî aborî ve, derbeyek giran li Moskoyê bixîne, béguman Pûtîn jî, ji vê yekê agehdare lê, herçawan ku min îşare pê kir, ev li ser vê baweriyê ye ku endambûna welatê Ukrayînê bi wateya vê tê ku berjewendiyên stratîjkî yên wan raştî metirsiyê dibin û her bi vê sedemê ye jî ku dibe tev mesrefa vê şerî bide bo vê ku Ukrayîn ji vê biryarê poşman bibe û sînorekê bo Natoyê diyar bike.

Li dawiyê de, tevî hemû givaş û sizayên Rojavayî û welatên din yên cihanê yên lidijî Rûsiye lê, diyar nîne ku şereke raştê dinavbera Rojava û Rûsiye de rû bide, diyare ne birêveberên Rûsiye û ne Rojava jî mil bo vê rû bi rû bûna raştê xwar nekirine.

Sedema vê eve ku eger kirîz heta vê astê bilind bibe eva egera şerê navkî û jinavçûna dualiyan tê gorê. Egera her tişt û heta şerê navkî li gorê de ye lê, piraniya şarezayên leşkerî û siyasî nerîna wan wusa ye ku, ev şera nikare heta asta şerê navkî bilind bibe. Bi texmînên wan ku Zilînskî serkoamrê Ukrayînê di encamê de neçar bi gotûbêjkirina li ser pîrsa şereke ya digel Rûsyayê bibe û eger wisa jî neke, Rûsiye dikeve rewşekê ku paytexta wî welatî dagîr dike û deştîlateke nû tîne li ser kar ku guhdarê wî be.

Encama welatên mezinhez nîgeranê binema exlaqan û yasayên navdewletî nînin belkî, nîgeranê berjewendiyên stratîjkî yên xwe ne û herwisa ya ku bona dabînkirina berjewendiyên wan hewce be encam didin. Her bi vê sedemê ye ku ev şera li çarçêveyekê de ye ku texmîn jêre nayên kirin.

Bandorên şerê leşkerî li ser jîngehê



N: Bêhzad Qadirî

W: Hesên Mukerem

Roja Pênçşemî 5'ê Reşemeha sala 1400'an, welatê Rûsiyayê êrîşî li ser Ukrayînê kiriye û di navbera wan herdu welatan de şer deştêpê kiriye. Tiştê ku hertim di medyayan de behs jê tê kirin, wêranbûna bajaran, kuştina xelkê sivîl û serbazan, gelek kêmbesana wan ziraran tê kirin ku raştî jîngehê dibin. Carê dibe zû be ku li derheq mijarên wuha de bi axivîn renga zû be ku ev zirarên han li jîngehê dikevin, piştî derbasbûna heyameke din zeq bin lê, ez di vê gotarê de behsa bandorên şerê leşkerî li ser

jîngehê dikim.

“Jiyan” û “Aştî”, du gherên binixrin ku, li bin siya wan de dikarin zemîneya vegeşîn û pêragihîştin, aramî û pêşkevtina civaka mirovahiyê barimte bê kirin. Ji wî alî ve, mirov bi awayek berdewam pêşwazî ji aştî û hevaltiyê dike lê mixabin, li ti serdemeke dîrokê de, nekariye xwe li şer û pevçûnan dîr bixîne.

“Şer” diyardeyeke naşîrîne û tevî standina can, wêrankirina derûna mirvan, wêrankerê sirûşt û jîngehê jî, sirûşt ku dabînkera hewcehiyên deştêpêkî yên mirovan e. Her bi vê sedemê jî, li madeyên 24 û 25'an de daxuyaniyek ku li Hezîrana sala 1992'an li bajarê “Rêyû” a paytexta welatê Birêzîlê de hat belavkirin, bi awayek êşkere îşare bi bandora wêranker a şer li ser jîngeh û rola pozetîv a aştîyê li ser vegeşîna

berdewam kiriye.

Li madeya 24 ya vê daxuyaniyê de hatiye: Şer, yek ji wêrankerên vegeşîna berdewame. Dibe ku dewlet li dema şer û perçûnên leşkerî de, rêz li wan yasayên navdewletî bigirin ku parastina jîngehê dikin. Herwisa piştî bidawîbûna şer, li vegeşîna zêdetre de beşdar bin.

Madeya 25 jî dibêje: “Aştî, vegeşîn û parastina jîngehê bihev re hatine girêdan û ji hev qut nabin”.

Tevî vê yekê ku, piraniya welatan ev daxuyaniya vajo kirine lê, vekolîn behsa tişteke din dikin ku ev jî, eve niha jî, şer zêdetrîn ziraran digihînin bi jîngehê. Her ji ber vê sedemê ye jî, saziya Neteweyên Yekigirtî(NY), li sala 2001'an de, Şê Gelarêzanê weke, roja cihanî ya berevanîkirin û mfah vergirtin ji jîngehê li dema

şer û pevçûnên leşkerî de deşt nîşan kiriye, da ku li ser zanyariyên giştî ên derheq bandorên şer yê li ser jîngeh û serçaveyên sirûştî tekez bê kirin.

Li gor raporên ku ji aliyê saziya Neteweyên Yekigirtî(NY) ve hatiye belavkirin, tenê li heyama salên dawîya sedsalên 20'î de li cihanê de, 118 şer û pevçûnên leşkerî rû dane ku di encamê de, nêzikî 6 milyon kes bûne bi koçber û herwisa xelk û jîngeh tûşî arîşeyên zêde kirin ev kêşe û arîşe bi wî rengî ne: “Koçberî, bilindbûna nexweşîyan, hişksalî û ... hwd”. Herwisa koma pîrs-girêkên ku heta niha dewsa wan xuyaye û nehatiye qerebûn kirin û piranî lê kevtine û lê dikevin. Navçeya Kendavê û welatên weke: Îran, Îraq,

»»»Dom R: 6

»»»Doma R: 5

Kuwêyt û Efxaniştan, ji wan welatan in ku tev ji wan bi sedema şer û pevçûnan zirar dîtine û heta niha jî bandora şer li ser roxsarê sirûştê wan welatan diyare.

Ji bo mînak, şerê malwêranker yê di navbera Îran û Îraqê yê li sala 1988'an dawî pê hat û "Sedam Husên" serkomarê wê demê yê Îraqê ku, li sala 2003'an de hat bidarvekirin. Lê, niha jî bandorên wê şerê li ser jîngeh û sirûştê bi awayek zeq diyarin. "Hur-Ele'izîm" yek ji talabên herî mezin a li başurê Îranê de ye ku, li ser fermana "Sedam Husên" hat hişkkirin da ku, rêya çûna hêzên rejîma Îranê li rêya wê talabê bo hûndirî xaka Îraqê bê darxistin. Niha hinek karnas li ser vê baweriyê ne ku hişkirina talaba mezina "Hur El-Ezîm" yek ji girîngertî sedemên berhemanîna toz û xaliyê li navçeya Rojhilata Navîn de ye.

Herwisa li Efxaniştanê ku ev heyama salên zêdeye şer û pevçûn vir berdewam e, tevî vê ku erdê wê tîjiye li mînen hatinê çandin, li hinek herêman de nîva dariştanên xwe ji dest daye. Pêka rapora ku derheq bernameya jîngehê ya Saziya Neteweyên Yekgirtî ku di heyama salên derbazbûyê de belav kiriye, zêdeyî ji sedî 50 darên Fîstixên li çiyayên Efxaniştanê hatine birîn û eva di halekê de ye ku jiyana ji sedî 80 xelkê wî welatî, bi şewazeke raşterast, girêdayî serçaveyên sirûştî û zeviyan ve ye.

Herwisa piştî êrîşa leşkerî ya Amerîkayê ya li dijî Îraqê a li sala 2003'an, ekosîstema Îraqê zirarên bê sînûr dîtî ku, heta îro rojê jî şûna wê her diyare. Li ser hev beşeke mezin li cureyên byûlojîkî yê Îraqê bi sedema şerên niha û yê borî, bo hertimî jî nav çûne û zêdeyî dariştanên wî welatî digel axê bûne yek. Navendên berprisên Neteweyên Yekgirtî, ji ber hebûna

metrsiyên demdirêj hişdarî didin ku, li rêya pîsbûna avên binerd û şewazên neştandard yê jinavbirina zibilan psîra Îraqê girtiye. "Ancîla Kilavsen" li Civata Navnetweyî ya pîzişkên dijî şerê navkî dibêje: "Tevî hemû wan kirîz û karesatan mixabin, rêjeya jidayîkbûna zarokên kêmandam, roj lipey rojê ber bi zêde bûnê ye".

Karesateke din ku jîngeha navçeyên din yê cîhanê raştî metrsiyê aniye, rûdana şerên navxweyî ne. Pêka rapora bernameya jîngeha saziya Neteweyên Yekgirtî, aliyê kêmandam ji sedî 40 şer û pevçûnên navxweyî yê li heyama sala 60'î pêştr de, digel sîdwegirtin û dest biserde girtina serçaveyên sirûştî ku peywendî hebûye, şerên navxweyî li piraniya welatên Aferîqayî bi şewazeke raşterast bona dagîrkirina serçaveyên binirxên sirûştî bûye. Herwisa li Rojhilata Navîn de, şer û pevçûnên zêde bona dest biserde girtina serçaveyên avê û axa mişe li gorê de bûye û heye.

Şerên navxweyî vê derfetê ji aliyên şer re dide ku bi mifah wergirtin li nebûna çavdêran, ku jîngehê kavl bikin û bi kêyfa dilê xwe mifahê ji serçaveyan werbigirin. Texmîn hatyê kirin ku, li welatê Somalî ku raştî şerên navxweyî bûye, li dehkên 90'î de, bazirganiyên neasayî û qaçaxkirina komr, her sal zêdeyî ji 384 milyon Dolarî dahat bo girûpên çekdar yê terorîst hebûye.

Nêçîra ne asayî ya ajelan jî ku, weke yek ji tawanên jîngehê bê rêzbandî kirin, ji îro şûnda bûye karesateke mezin û micid. Texmîn hatyê kirin ku nêzikî 15 heta 20 milyon Dolar pere di vê rê de dikeve destê terorîstan û girûpên çekdar ku li rêya nîçîrkirina ajelên weke Fîl û Kergerdenan. Herwisa di piraniya beravên Aferîqayê de nêçîrên wuha bi piştevanîkirina girûpên çekdar ku li halê şer digel desthilata navendî de ne tîne encam dan. Ev kirîza han carê, li welatê Îraq û Sûriyayê de berdewam e. Girûpên terorîstî û çekdar,



ên weke girûpa terorîstî a DAÎŞê barek giran xistiye li ser milê jîngeha wan welatan. DAÎŞ û girûpên terorîstî yê din bi mifah wergirtin ji amûrên şer, av û xaka wan welatan pîs dîkin. DAÎŞ bi talankirina serçaveyên sirûştî û mfah wergirtina neguncav û nerêde ji wan serçaveyan, jîngeha wan navçeyan wêran kiriye û ber bi aliyê jinav birinê ve birine. Herwisa welatê Sûriyayê jî ku, li sala 2011'an de, raştî şer hatiy, tevî derd û êşên mirovan û herifandina aboriya wî welatî, karesateke mezin a jîngehê jî lipey xwe hebûye. Saziya Holandayê a çalak li barê karûbarên jîngehê ya naskirinê bi navê "Pêks" ku, vekolînên li derheq rewşa jîngeha Sûriyayê de encam daye, derheq karesatên jîngehî yê wê navçeyê de çendîn rapor belav kiriye. Herwisa karnaseke paye bilind yê wê saziyê dibêje: "Koma parên berfireh ji jîngeha welatê Sûriyayê jinav çûne û madeyên jehrî ku li karesatên şer de hatine bikar anîn û herwisa kavlên avahiyan û rêjeya herî zêde a zibilan ku li kûrahiya axê de nifûz kirine, avên binerd yê wî welatî pîs kirine. Niha jî şûna raşterast û neraşterast yê şer diyar dîkin. Aliyê kêmandam dibe 25 sal dem derbas bibin da ku jîngeha welatê Sûriyayê bikare heta asteke kêmandam xwe paqij bike û heta wê demê xak û ava wî welatî şiyana mfah wergirtinê jê tune ye. Ew madeyên han tendruştîya mirovan jî, raştî metrsiyên micid tîne.

Ji aliyekî din ve li Îranê, rejîm li rêya hêzên xwe yê serkutker bitaybet hêza

Spaha terorîsta Pasdaran, bilî vê yekê ku li dirêjahiya wan 40 salên desthilatdariya xwe de, tev serwet û saman û serçaveyên Kurdiştanê talankirine, pîlana kavlkirin û talan û wêrankirina sirûşt, jîngeh û dariştanên zagrosê jî, li nav rêza bernameyên wî de ne.

Tevî wan hemû karesatan, Saziya Neteweyên Yekgirtî li ser bi rê ve birina guncav û drust a serçaveyên siroştî li dema nûjenkirina navçeyan bo zirvandina rewşa wan navçeyan bo rewşa pêş li şer de tekez dike. Raporên cuda yê hatinê belavkirin yê ji aliyê wê saziyê ve li derheq dana berhev a jîngeheke wuha ku bandora şer li ser hebûye, nîşan dide mfah wergirtin ji çek û teqemeniyan û bal nedana demdirêj bona nûjenkirin û çêkirina rewşa jîngeha zirar dîtî, lêkevten xerab û qerenebû kirî lipey hedibe ku, renga bi ti aştîyekî neyên qerebû kirin.


Bandorên jîngehên şeran, sînorên cografî jî derbas dîkin û herwisa nebûna birê ve beriyetîyeke dirust li dema şer de û herwisa piştî bidawîbûna şer û nûjenkirina sirûştê hatî wêrankirin ku, dikare bandorê li ser tendruştîya xelkê û zirarê gihandin bi sirûştê qurbaniyan bigire. Çavlekirina li rewşa jîngehê li wan navçeyên ku vir şer rû dane û berdewame. Nîşan dide ku jîngeha netenê wan navçeyan belkû, jîngeha seranserê cîhanê li metrsiyê de ye û dibe pêngavên micid bo bîna avêtinê çimkî, li îro şûnda zêdetr li her demî gerdon, jîngeh û jiyana mirovan metrsî li ser e.

Nerîna Lîderan



Mackenzie:

“Îran mezintirîn gef e bo ewlehiya Amerîkayê”.



Putin:

Bi şer be yan bi aşî, Rûsya dê bigihe armancên xwe



Blinken:

Emê berevaniya axa NATOyê bikin



“Macron:

Zextên me dê ji bo rawestandina êrişên Rûsyayê bidomin

Rojhilat xwe ji bo Newrozê amade dike



N: Eskender Ceiferî

Li cem Kurdan, Newroz bûye sembola xebat ji bo azadiyê û têkoşîn li dijî dagirkaran. Rejîma Komara Îslamî a Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heta partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, rejîma Komara Îslamî jî nîgeran e.

Newroz bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan deşthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine rêwresma Newrozê bi rengekî ciddî were pêşwazîkirin. Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî, weke rejîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Aliyên siyasî yên Rojhilat, di salên derbasbûyî de li ser pêşwazîkirina hevpar ji Newrozê lihev hatine. Belkî ev, zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên nasyonalîst û komonîst ên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn. Piştî biryarên wan partîyan di salên bihorî de, pêşwaziya hevpar ji Newrozê ji aliyê partiyên Kurdî ve, tevgera mezîna di nava Spaha Pasdarên Îranê de çê bûye.

Ew ditirsîn vî carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî ji nava Spahê amaje dikin ku bajarên Sine, Îlam, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke ya hêzên wê rêxistina terorîst. Bi vî rengî ku tîrîstên Sipahê, di nava xelkê sîvil de digerin



û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku behsa Newroza hevpar a aliyên Kurdî bike, bê girtin. Ji xeynî tevgerên Spaha Pasdaran, selefî jî li hemberî nasyonalîstan tene çalakîkirin. Plana herî dawî ya Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku nasyonalîzma Kurdî di landikê de bife-tîsin. Li gora zanyariyên çavkaniyê veşartî a saziya Îstixbarat angû Îtîlaata Îranê, eger tevlihevî an jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî deşthilat çê be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Her sal, hejmara kesên ku li Rojhilatê Kurdistanê di encama nebûna derfetên kar de dibin kolber, bilind dibe. Rêjeya kuştina kolberan, girtina Kurdan bi tometên siyasî û herwisa rêjeya darvekirina welatiyan zêde dibe. Tepisandina xelkê berfirehtir dibe lê dîsa jî xelk guh nade rejîmê.

Her sal qedexetî dikeve ser pêkanîna rêwresma Newrozê lê tevî vî jî xelk cejna xwe pêk tîne û slogana partiyên xwe li dijî dîktator, hildide. Her Newrozek, ji bo Kurdan referandûmeke serxwebûnê ye ku li dijî Tehranê li hemû navçe, gund û bajaran pêk tê.

Aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin deşthilata Komara Îslamî de, hilbijartineke demokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim

hilbijartinê baykot dikin. Li gor wan, her sal Kurd di Newrozê de biryara xwe li dijî dagirker diştînin û soza xwe bi rîya şehîd û cangoriyên niştîman re nû dikin.

Li bendê ye ku careke din, referandûma serxwebûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê tevahiya partiyên di nav Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê ve bi rêve biçê. Her yek ji wan, sloganekê ji bo azadiya niştîman hil dide. Taktîk jî cuda ne.

Lê armanca hevpar, bûye sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin heya dakevin kolanan û bi reqs û dawetê, dilê dagirker bihejînin û car din jê re bêjin ku evder welatê me ye û em ji bo pêkanîna tevgeran li ser axa xwe, îznê ji ti kesekî naxwazin û Newroza me, dengê dijatiya me ya li hemberî dagirker e.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûyan deşt dane hev û ji Agirî, heya Bozê Sîna, ji Kêleşîn heya Arbaba û ji Dalaho heya Qelaçolan, dengê pêşmerge di nav keç û xortên Kurd de reng vedide û ewê bi şewqên agir û rojê û bi tîrêjên dilên dayîkên şehîdan herin pêşwaziya Newrozê û zêdebarî hemû rêwşûnên tund ên ewlehî ji aliyê rejîmê ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê re germ e û referandûma me wê di dema xwe de birêve biçê.

Şerê Rûsya-Ukrayna û kartêkirina wê li ser Rojavayê Kurdistanê



N: Ebdûlazîz Qasim

Rûsyayê di 24'ê Şibatê de, êrîşî li ser Ukrayna kir, û wê êrîşê cîhan bi tevahî ber bi aloziyek mezin bir, û bi awayekî zelal careke din nîşanên duberekiyê di navbera Amerîka, Ewropa û Rûsyayê de destpê kir, û di nav de dewletên cîhanê li gorî berjewendiyên xwe helwestan digirin, ku bi piranî li dijî wê êrîşî ne.

Tevî ku ev şer di destpêka xwe de ye, herwiha ku heta niha Amerîka û dewletên Ewropayê bi awayekî leşkerî tevî şer nebûne lê, helbet berdewamiya wî şerî wê karasetek mirovî mezin peyda bike, û dûr nîne ku ev şer ber bi şerekî nûklerî jî biçe û bibe destpêk bo peydabûna şerekî cîhanî “şerê sêyem”, herwisa sîstema cîhanî ya niha têkbiçe û sîstemek cîhanî nû peyda bibe.

Ukrayîna û Rojhilatê Ewropayê, anku “qada şer” ji aliyê cografî ve ji kurdistanê dûr e lê, dibe germahiya şer bigehîje kurdistanê, nemaze ku Rûsya û Amerîka wekî du hêzên navdewletî yên herî mezin pêgeh û rolek wan ya sereke di navçeyê de heye, helbet me bivê ya nevê de kartêkirina şerê Ukraynayê li ser Rojhilata navîn û di nav de li ser tevaya kurdistanê hebe, nemaze li ser rewşa Sûriyê û di nav de bi taybetî li ser rewşa Rojavayê Kurdistanê.


Çavdêr û şirovekarên siyasî analîzên cuda cuda li ser kartêkirina şerê Rûsyayê-Ukraynayê li ser qada Sûriyê didin, hin dibînin ku rola Rûsyayê li Sûriyê wê bi awayekî zêde lawaz bibe, bi sedema mijûlbûna wê bi



qeyran û rûbirûbûna bi rojava re, berewajiyê vê boçûnê, hin dibînin ku dibe Sûriyê bibe qadeke şer ya din ji bo rûbirûbûna hêzên Amerîka li navçeyê, herwiha dibe ku Rûsya hêzên xwe yên li ser derya Spî û li serbazgên Lazîqiyê û Tartusê ji bo operasyonên leşkerî li dijî berjewendiyê Ewropa û Amerîka bikar bîne, nemaze ku berî destpêkirina êrîşa li ser Ukrayînayê, Wezîrê Berevanîyê yê Rûsyayê Sergey Şoygu di 15'ê Şibatê de serdana Sûriyê kiribû, û beşdarî manhoreka serbazî kiribû, ku bi beşdariya 140 keştiyên şer yên binav, Firqat û keştiyên deryayî û 40 balefirên şer hat encamdan, tevî ku berî destpêkirina manhora serbazî, Rûsyayê şeş keştiyên mezin û firokeyên şer ji Deryaya Baltîk şandin serbazgeha Tartus û di dawiya meha Çile de, firokeyên şer yên Sukhoi 34 û 35 û mûşekên Tu-22M, balafirên MiG-31 yên bi mûşekên TS yên “hîper-sonîk” şandin bo serbazgeha Hmeimim.

Wekî em dizanin ku hêzên Rûsyayê ji bo piştgiriya rêjîma Sûriyê, di 30'ê Îlon/September 2015'an de derbasî Sûriyayê bûn, ji wê rojê û heta îro dikarin bêjin ku kêman yan zêde: Ku çarênivîsa milletên Sûriyê û paşeroja wê bi awayekî mezin ket di destê Rûsyayê de, lewra goman tede nîne ku kirîza Sûriyê wê ber bi aloziyek mezintir biçe, ku yekser piştî sepanîna hin sîzayên abûrî û darayî li ser Rûsyayê, nîrxê Lêraya Sûrî bi awayekî mezin têkçû, herwiha ku dibe gelek alîkariyên mirovî li ser xelkê Sûriyê bêne birîn û heta dibe ku gelek dewlet di siberojê de beşdar di proseya avedankirina Sûriyê de nebin.

Lê, her çawa be, bi dîtina min ku hin cudahî heye di navbera Ukrayînayê û Sûriyê de, jiber têkildariya ewlehiya Îsraîl bi rewşa Sûriyê ve, ku ewlehiya Îsraîlê wekî xalek hevbeş di navbera Amerîka û Rûsyayê de tê de dîtin lê, li aliyek din dibe ku nakokî li ser Idlib û Efrînê di navbera Rûsya û Tirkîyê de zêdetir bibin, herwisa ku hevpeymanîya Aştanayê ya di navbera Rûsiya-Îran-Tirkîyê de wê hilweşê û tek biçe, ku kartêkirinek wê ya herî xirab li ser kurdistanê Sûriyê hebû, û di bin sîbera wê de gelek navçeyên kurdistanê Sûriyê di nav de Efrîn, Girêspî, Cerablîs û Serêkaniyê hatin dagîrkirin, lewra dibînim ku heta radeyekî wê navçeyên kurdî, herwiha pîrsa kurdên Sûriyê wê ji bazîne bazarên di navbera Rûsya, Tirkîyê û Amerîka de derkeve, û dibe aliyên navdewletî guhdariyek zêdetir bi pîrsa kurdî bidin.



Mêr gure û jin melayîke



N: Vênûs Fayîq

W: Hesên Mukerem

Ev tişteke bê wateye ku, em bêjin tev mêr gur û celad in û tev jin jî melayîke û qurbanî ne, kultûrek heye ku dibe li ser vê biaxvin, kultûra ku mêran dike gur û jinan jî dike bi qurbanî. Kultûrek ku mêr di nav de li pileya yekem de ye û jin li pileya duyem de, mêr biker û jin karlêker, mêr serdest û jin bindest.

Lê, axavtin tê li ser çawanîya guhertina civakê, dibe virda mirovahiye bixînin nav du kevaneyan de û bo aştî hişyariya civakê şirove bikin. Jiberku, tev mêr mersalar nînin û tev jin jî qurbanî nînin.

Mêr heye heta li ser heştîya li dijî mersalariya civakê ye, û jin jî heye bi bê vê ku ev bixwe bizane li ser zeliqandina bêrdiziya mersalariyê bandor kiriye yan bi bêdengbûna xwe an jî li ser vê baweriyê ye, neku ev yasaya jiyanê ye û guhertinê de tune.

Her ji ber vê yekê, niha axavtin li ser şewaza berevanîkirina jinan li warê mirovahî û kirameta wan bixwe û şewaza mafên ku ev daxwaz dikin de ye, axavtin li koma kultûrê ye ku mêr kiriye weke Dêv û Derenc û jin jî kiriye weke canlibereke êxsîr û bê desthilat yan jî wusa jê dike.

Sedema serek ya bona vê ku jinek bê çewsandin gelek hêsane, li pileya yekem de ev bixwe ye ku, yekem car vê yekê erê dike, bo minak merek bo cara duyem dest li ser jinê bilind kiriye û jina wî jî erê kiriye, wuha him ev bixwe bo lêxistinê rê dikeve



û him jî mêr, cem wan ev dibe tişteke asayî ku li hevjinê xwe bixe.

Êdî tirsandin, lêxistin û sivkatîkirin dibin kultûreke civakî a malbatê û êdî ev malbat hewayek tendrûst bo siyên wan naçe û vê demê gelek bê wate dibe di nav dîwarên vê malbatê de behs ji tiştêkê bê kirin bi navê hejêkirin.

Ev zaroka ku li hûndrî vê malbatê de jî, li dema çav vekirinê de, perwerdehiyê dibîne, nan dixwe, avê vedixwe û mezin dibe bi bê vê ku, ti tiştî li ser navê hejêkirinê ezmûn bike û tev tiştên ku li derdora çarçêveya vê malbatê de dibihîse û dibîne, li ser navê hejê kirinê li cem wî di rêza soç, tawan û bênamûsiyê de cih digirin. Çimkû, tiştêk li ser wî nehatiye perwerdekirin û digel de rêk nekevtiyê û li dîtingeha wî, tev jin dibe zelîl, şikestî û stûxwarê mêran bin û li aştî dengê bihiştinê de nebin.

Her bi vê sedemê ye ku, berxwedanîkirin li hemberî tûndîtîjiya jinan li hûndirî malbatan de destpê dike

çimkû, li hûndrî malbatê de jin tê çewsandin û ev mêrê ku li hûndirî malê de jinekê biçewsîne, li derve jî jehra bênamûsiyê belav dike.

Ev jina ku di nav malbata xwe de raştî tûndîtîjiyê dibe çî li hûndrî malbata xwe de û çî jî li derveyî malbatê de digel wî mêrî diaxive ku, li nav

malbatê de wê diçewsîne û sivkatîyê pê dike, li dîtingeha wan, pênaseya mêranîbûnê wiha ye.

Tûndîtîjiya li dijî jinan aştên cuda hene lê, di dawiyê de tev di yek rêzê de cih digirin û ev jî rêza bi kêmbûnê jîn û bi êxisîr kirina wê ye.

Ev mêrê ku li hûndirî malbata xwe de li hember jineka malbata xwe, weke hevjin, keç yan xwîşka xwe û ... hwd de, tûndîtîjiyê bi kar tîne, ti cudahiyeke digel wî mêrî tune ye ku bi awayê zorê leşfirota jinan dike û laşê wan difiroşe û wuha pere dest xwe dixîne. Herdu tawan, du roxsarên diyardeya qirêj jêre tê gotin “ tûndîtîjiya li dijî jinan”.

Di raştîyê de, ev jina ku li hember wê de tûdtîjî tê encamdan û ev jî vê yekê erê dike, yanî ev jin sê caran rastî bêrêziyê dibe, cara yekem ji aliyê hevjinê xwe ve raştî tûndîtîjiyê dibe, cara duyem ji aliyê wê bixwe ve ku rêz ji xwe nagire û ev yeka erê kiriye, cara sêyem jî ji aliyê desthilateke hikûmî û yasayî ve ku rêz ji mirovatiya regeza jinê nagire. Li wan herdu haletan de jî, mêr rêz ji xwe û ji hevjinê xwe negirtiye.

Îcar dibe îtraf bi vê yekê jî bikin ku, hemû mêr li dijî jinê tûndîtîjiyê bikar nayînin lê, haletên tûndîtîjiyê ev dubare kirine ku, yek mêr di şiyana wî de heye ji tev jinên civakê re sivkatîyê bike,

merek bi tena serê xwe dikare li hemberî çendîn jinên derdora xwe re tûndîtîjiyê bikar bîne.

Di civakên bi wî şewazî de, baştirîn jin evin ku stûxwarê mêrên zebedeştin û ev jinên ku zilm û zordariya mêran erê dikin, weke jinên xwedî rêz û bihormet û binamûs tî pênasekirin, bilî ji wana, evên ku li hemberî merekê de disekin û li ser mafên mirovî yên xwe pêdagîr dibin û razî nabin ku ji wan re sivkatî bê kirin û tûndîtîjiyê erê nakin, li hemberî mêrê ser hişk de helwestê digirin, yên wiha li dîtingeha civaka mersalariyê, bênamûs tî naskirin, û herwisa ev jinên ku civak biguman mîzeyî wan dike, hertim biguman digel wan mî`amile tê kirin.

Dema ku wiha ye, şerê jin li hemberî mêr de nîne belkû, li hemberî sistemeke civakî, îdarî û dadweriyê de ye ku, weke yasayek bêminak û hatî sepandine li ser wan hemûyan de bi bê hebûna ti cudahiyeke ji wan re sînoran dide diyar kirin. Çimkû ya ku jinê hewcehî pê heye, çek, tank û bombe nîne bona vê ku mêr pê jinav bibe belkû, hewcehî bi sistemekî civakî ye ku, wekheviya wê digel mêrê wezîfe û mafên wê bîndan e.

Hewcehî bi vê yekê heye ku tevahiya kultûra paremayî li mejiyan betal bike da ku êdî nifşa nû li ser vê yekê perwerdehiyê nebîne.

Zewaca zarokan û encamên vê



N: Niştîman Urmiye
W: Hesên Mukerem

Konvansiyona Mafê Zarokan; Zarokên ku ji dayîk dibin heta temenê 18 saliyê wan weke zarok dihesibîne; Saziya Neteweyên Yekgirtî jî, her cure zewaca xwarê temenê 18 saliyê, zewaca zarokan yan zewaca zarokên kêmtemen dihesibîne û herwisa, ji aliyek din ve Saziya Têndrûstiya Cîhanî temenê 15 saliyê sînorê zarokan daye naskirin û li ser vê bingehe mirovên ku temenê wan xwarê wî temenî be zewcî bin zarok tên hesabkirin.

Li seranserê cîhanê, her sal bi milyonan keç berî li temenê 18 saliya xwe de dizewcin ku, hin caran keçên temenê wan di navbera 6 heta 8 saliyê de ye jî, di nav vê rêzê de xuya dibin. Di piraniya welatan de zewaca zarokan berdewam e û derbe û encamên vê di welatên li halê pêşkevtinê de û herwisa welatên pêşnekevtî û paremayî de zêdetir e. Herwuha li Îranê jî, zewaca zarokan hîn jî weke derbeyek girîng û micid e, bo civakê û bo wan keçikên ku mafê zarokatiyê ji wan tê standin. Di vê rewşê de paşeroja zarokan raştî metirsiyê dibe.

Zarok ji aliyê derûnî û fîzîkî ve amadehiya vergirtina barê giran yê jiyanê tunînin lê, neçar dibin wê yekê erê bikin.

Jiber ku heta vî temenî, zarok mezinbûn, mezinbûna zêhnî û mezinbûna bedenî ya xwe derbas nekiriye, û bona hebûna roleke erênî di nav civakê de, pêşkevtina zêhnî û têgihîştina jiyanê ya bîmfah bideşt nexistiye, yan bi gotinek din dewrên vegeşin û mezinbûna xwe de,

li qonaxên herî kêmtir de ne û xwedî meylên rûpî (lêb) in û di rûbirûbûna li hemberî serewrazî û sernîşîviyan û kûrahiyên derbeyên bi sedema zewaca di temenê kêmtir de ne. Û her bi vê sedemê ye derbeyên bandordar di vê pêvajoyê de, di demdirêj de dibin rêyên cuda yê pêşnekevtina civatiya civakê.

Di piraniya civakên pêşnekevtî û paremayî de welatên ku rola meseb di kûrahiya edet û kultûrê de, reh û rîşe hene û cudahîdanîna zayendî girîngtrîn peyman û lihevkerina çîn û texên civakê pêk tîne, ji zarokê weke hevjin ji bona serkevîna di aramancên nêrsalarane yê xwe de, mifahê jê verdigire. Her di hememî temenê zarokatiyê de bona rolên tijî taloke ku derbeyên derûnî û bedenî lipey xwe hene amade dike.

Herwisa di piraniya civakên paşvero de ev rola ji daxwaz û meylên keçikên zarok re hatiye spartin, bi gotineke din hin sînorên gengaz ku li ser rê berbestin hatine vêddan û keçika zarok û temenê kêmtir ku carê li warê hizirkirin û mejiyê xwe de negihîştîye asta pêşkevtinê û biryar distîne, û di vê mijarê de dibe şêrka cîhana xwe û xwe ber bi aliyê jinabirina jiyanê ve diherkîne.

Jiber ku dana desthilateke wuha ji keçika kêmtir temen re, di qonaxa destpêkê de bi daxistina deriyên herî zêde yê civaka kevin jê dikeve ku, bi wateya kûrahiya ştratîjiya nêrsalariyê li ser vê koloniyaya kevin(jin) de ye. Ji ber vê yekê piraniya karnas li ser vê baweriyê ne, zewaca zarokan mînakê zelal ya fîmînîsayîde yan komkujiya jinan e.

Reha vê diyardeya neasayî û nenormal di kevneşopiyên rizî de dibînin lê, siyasatên desthilatdaran di destgiritin û berfirehkirina piroseya ze-

waca zarokan de bandordar dizanin.

Em dikarin bibêjin ku, zewaca zarokan di civaka Îranê de li heyama salên derbasbûyî de, bi awayekê bê sînor berfireh bûye û roj lipey rojê berfirehtir dibe. Siyaset û siyasî hikûmetî, edetên malbatan, di wan demên dawiyê de perwerdehiya pirtûkên dersê yê li dibistanan de, sedemên herî gelemperî di geşekirina vê diyardeyê de.

Sedemên sereke yê berpirsyar di vê mijarê de zêdebûna asta hejarî û desttengî, nebûna zanişt û guhdarîkirina ji hewcehiyên kultûra nêrsalariyê ye, û herwisa hebûna wan baweriyên ku bi şaşî neçarkirina keçikan bo zewaca ne bidil û di temenê kêmtir de, weke sedemekê bona piştevanîkirin û berevanîkirina ji wan dizanin. Digel hebûna encamên bedenî û cudahiya derheq keçikên temenê kêmtir de, li Îranê pêngavên gelek kêmtir bona bidawî anîna zewaca li temenê kêmtir a zarokan hatine avêtin.

Ev yek dikare bê erêkirin ku yek ji pirsgerêkên sereke yê civaka niha ya Îranê zewaca zarokan di temenê kêmtir de ye ku, digel hewldanên berfireh yê çalakvanên di hewzeyaya mafê zarok û jinan de carê yasa berdewam e. Herwisa amarên zelal yê li derheq zewaca zarokên kêmtir temen de jiber dest tune ye loma, pêka yasayên hakim temen ji bo keçikên temenê 13 salî û herwisa temenê 16 salî bo xortan hatiye diyarî kirin, û li gorî yasayên şerî`etê keçik li temenê 9 saliyê de dibe bizewce û bo xortan jî her vê yasayê temenê 15 salî diyar kiriye. Ji ber vê yekê daneyên ku hatine bideşt xistin evqas ne zelal in, ji aliyekî ve amarên ku li navenda amara Îranê tîne weşandin diyar dikin ku, di heyama îsal de 7 hezar û 300 zewacên di navbera temenê 10 heta 14 saliyê pêk hatine.

Pirsgerêkên zewaca zarokan Zewaca zarokên kêmtir temen

xwediyê encamên berfireh û qerebû nekirîne û li ser du navokên dualî yê civaka modern û kevneşopîya Îranê bandordar e, netenê civaka kevneşopî ya ku ev pirsgerêka li hûndr de derkevtîye û di halê lezgînî û berfirehbûnê de ye belkî, civaka ku xwe kêmtir û zêde pêşkevtî dibîne ji ketiye bin bandora vê pirsgerê de.

Ji encamên herî girîng ku dikare bi her awayî bibe encama vê pirsgerêkê, di dest pêkê de tundtîjiya li hûndirî mallbatê de (Fîzîkî û derûnî), bêparbûn ji xwendin, tundtîjiya vegotinê, lêxistin û îşkencekirin û ... hwd li pey xwe hedibe. Ji wan modelan, resimandina warê mêran li ser esasê cudahîdanîna zayendî ya herî dijarwar e.

Jiberku xwediyê vê herêmê hilgirê hizireke cudaye ku ji vê lewaz(jin)ê, li ser bawera xwe herçawan ku bixwe dixwaze di raşt desthilatdariya xwe de perwerde dike, û her bi vê sedemê ye ku, di heyama salên derbasbûyî de, qetlên namûsî weke girîngtrîn çalakî ji kûrahiya vebertekê de xwe derxistiye û jin weke kelûpel hatiye mi`amilekirin, herwisa bi awayekî hêza desthilatdar û biryar standinê bi awayek gelek hêsan ji jinan tê vegritin û ji qada tenezilê re tê dayîn ku, yek ji mezintirîn wan sedemanin ku di temenê zarokatiyê de dikevin bin barê serdestiya mêran de û teslîmê ramanên aloz û nakok û cudahî danînê de ne.

Encam û pirsgerêkên herî girîng yê ku di zewaca zarokên kêmtir temen de lipey xwe hene wuha ne:

1_ Veqetandina heştyarî ku piranî bi sedema hebûna cudahiya di navbera temenê vebirêya kor ku ne evqas qahîme, ji lîrîna jiyana hevpar re tê girêdan ku, hinek caran

»»»Doma R: 10

ev şewaza jiyanê heta dawiya temenê yek ji hevjinan de berdewam dibe.

2_ Bilindbûna amarên jihev veqetiyên(telaq): Di heyama salên derbasbûyî de, yek ji çavkaiyên herî girîng di berfirehbûna diyardeya zewaca di temenê piçûk de bûye ku, piraniya caran têgiheştin di

zewacên wuha de tune ye

3_ Qetla namûsê: Ezmûnên salên derbasbûyî yên di hewzeya mafê jinan de vê yekê nîşan dide ku, piraniya diyardeyên kuştina jinan li derdora jinên ciwan de ku zêdeyî ji wan li zarokatiyê de çî li ser daxwaza xwe û çî jî, li ser nerizayetiye pêngav avêtine nav jiyana hevpar de diqewmin.

4_ Zêdebûna lawaziya pêşveçûna civakê: Jiberku jin weke nîva ji peyker û laşê civakê ji çerxa aktîv û piroseya perwerdehiya civakê dûr hatiye xwedîkirin û ev rewta bandoreke bêhevsengî li ser pêşveçûna civakê û nederbasiya civakê heye yan bi gotinek din rola cîhana sêyem li civakê de birêve dibe.

5_ Dûrragirtina jinê û bêrengkirina rola wan di çalakiyên aborî de: Jiberku çalakbûna jinê li çerxa aborî de, weke serbixwiya aboriye ku, serbixweya manewî jî ji vê vediqete, û jina kêmtemen(zarok) di çarçoveya îzolasyonê de ku rola vê li hûndrî malê de hatiye xwarkirin û sînordarkirin.

Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistabnê de

Saziya Berevanî ji Mafê Mirovî ya Kurdistanê daxwaza azadkirina “Zeyneb Celaliyan”ê kir

Ofîsa Saziya Berevanî ji Mafê Mirovî ya Kurdistanê bi rêya belavkirina daxuyaniyekê li derheq nexweşiya girtiya siyasiya Kurd a bi navê “Zeyneb Celaliyan” û derbasbûna 15 sal bi ser girtîgeha wê jina Kurd, daxwaza azadkirina navbirî dike. Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Daxuyaniya ofîsa Saziya berevanî ji Mafê Mirovî ya Kurdistanê

Girtiya jin a bi navê “Zeyneb Celaliyan” ku tê gotin bi sedema pêwendî digel girûpên dijber, bi girtîgeha heta hetayî hatiye

cezadan, nêzî 15 sal ji cezayê xwe li girtîgehên Xoy, Urmiye, Kirmaşan, Tehran, Qerçek, Yezd û Kirmanê derbas kiriye. Tê gotin ku navbirî tûşî nexweşiyên curbicur bûye û zêdetir li sal û nîvekê ye ku dayîka wê ya bi temen û malbata navbirî ji rewşa wê, ti zanyariyek tinînin.

Ofîsa Saziya Mafê Mirovî ya Kurdistanê bi balkêşandin bo ser rewşa nexweşiya “Zeyneb Celaliyan”ê, piştî derbasbûna 15 sal ji cezaya wê, daxwaza azadiyê bo navbirî dike.

Bi wê hêviyê ku dezgehên dadwerî û dezgehên asayîşî yên peywendîdar, bi kêmkirina heyama girtîgeha wê û pêdaçûn li doseya wê girtiye, derfeta azadkirina wê girtiya Kurd bê rexsandin.

Rêkevt: 15`ê Reşema sala 1400`an

6`ê March a sala 2022`an

Îsal li parêzgeha Urmiyê • haletên agirberbûnê qewimîn e

Fermendarê Yekeya Parastina Çavkaniyên Sirûştî û Avrêjvanî yê parêzgeha Urmiyê “Mîrme`isûm Rewzeyî” got: “Îsal 50 haletên agirberbûn li çêrîngeh û dariştanên wê parêzgehê, qewimîn e”

Herwisa “Mîrme`isûm Rewzeyî” gotiye: “Piraniya wan agirberbûna taybet bi dariştanên bajarê Serdeşt, Pîranşehr û Urmiyê bûne”.

Fermendarê Yekeya Parastina Çavkaniyên Sirûştî û Avrêjvanî yê parêzgeha Urmiyê, îşare bi xisarên wan agirpêketinan nekiriye, lê sedema agirberbûnan li çêrîngeh û dariştanan girêdayê bi hişkesalî, guherîna keş û hewa û ...htd da zanîn

Kolberek Kurd li ser sînorê bajarê Merîwanê hate birîndarkirin

Êvareya roja Înê 13`ê Reşemê, kolberek Kurd ê bi navê “Cebar Salihî” temen 33 salî kurê Hecî Ehmed û xelkê gundê

“Wuşkelan” ê girêdayê bajarê Merîwanê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê wî bajarî hate birîndarkirin.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina berê ew kolbere digel hejmarek ji kolberên din dabûne ber gulleyan.

Ew kolbere bo tedawiya pizîşkî bo nexweşxaneyê bajarê Sineyê hate veguhestin û rewşa giştî ya navbirî nebaş hatiye ragihandin. “Cebar Salihî” xîzandar û bavê du zarokan e.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (417)

8`ê Mars

Rasana Rojhilatê bi
azadjiyana jin ve serdikeve



8`ê Mars

Matê netewî û vekhevî
bi hev re girêdayî ne



8`ê Mars

Jin jiyanê vedijîne û
şoreşê pirreng dike



Dezgeha Ragihandina
Gileşî ya PDKî

Dezgeha Ragihandina
Gileşî ya PDKî